Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Îlon / 15 - 9 - 2020 Kurdistan-Hejmar (181) www.pdk-s.com

Rewşa tenduristî li Kurdistana Sûriyê xerab e û pêwîste xelk pabendî rênmayan bibin

Kurdistan **Emel Reşîd**

Li Kurdistana Sûriyê rojane hejmara pêketiyên vayrosa korona zêde dibe, herwiha hejmara jiyanjidestdanê jî ligel hejmara pêketiyan zêde dibe, û sîstema tendursityê jî lawaz e û pêwîstiya wê bi guherînê heye. Jiyan Ehmed li ser vê mijara hestiyar wiha dibêje: Bi rsatî korona gelekî li deverên me belav bûye û zehmet e were kontrolkirin, lewma pêwîst e xelkê Kurdistana Sûriyê bi her awayî xwe biparêzin ji ber ku xweparastin baştirîn çareserî ye di vê demê de ji berk u diyar e dê vaksîna dijî vê nexweşiyê dereng bikeve. Can Xidir jî li ser mijara tenduristiyê dibêje, rewş gelekî xerab e û hejmara tê ragehandin gelekî ya rasteqîne kêmtir em dive dergehê hatina welatiyan ji firokxaneya navdewletî ya Qamişlo were girtin da ku rê li ber belavbûna zêde ya korona were girtin, ev yek jî heta niha karekî cidî li ser nehatiye û ev yek ji aliyên peywendîdar tê xwestin.

Hewlên yekrêziyê li Kurdistana Sûriyê berdewam in, û welatî jî li hêviya rêkeftinê ne

Kurdistan-
Hemrîn Kamîran

Hewlên nêzîkbûna aliyên Kurdî li Kurdistana Sûriyê berdewam in, Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê berdewam radighîne ku ew li ser karê yekrêziyê cidî ne û daxwaz ji aliyê din jî dike ku ew jî li ser vî karî cidî be, û nekeve jêr fişarên destêwerdanên derve, û hewil bide astengiyan derbas bike. Lê li aliyê di gelekî daxuyaniyan di vê derbarê de nade. Hin çavkanî eşkere dikin ku rêkeftin di demeke nêzîk de di navbera ENKS û Patiyên Yekîtiya Niştîmanî li ser bingeha hevbeşiyê tê encamdan, lê welatî jî bihêvî ne ku rêkeftin pêk were û ew ji derd û êşên ku têde dijîn rizgar bibin û jiyaneke xweş derbas bikin. Mihemed omer wiha di vê derbarê de dibêje, Heger hat û ev rêkeftin di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS û Patiyên Yekîtiya Niştîmanî hate kirin, dê rewş li deverê gelekî bê guhertin û dê xelk hest bi aramiyeke zêdetir bike, bi yekbûna liyên Kurdî helwesta Kurdan beramber opozîsyonê, herwiha li pêş raya giştî jî bihêz dibe, lewma pêwîst e ev lihevhatin di demeke nêzîk de were encamdan, û êdî xelk ji karesat û derbiderî û azaran rizgar bikin, û hewil bidin jiyaneke xweştir ji xwe re dabîn bikin. Canda Xelef wiha li ser vê mijarê dibêje, Berya her tiştekî divê destêwerdana Partiya Karkerên Kurdistanê PKKê di nava karûbarê Kurdistana Sûriyê de were rawestandin, ku ev yek jî di rêya destikên wê de tê kirin û dixwazin danûstandin neçin serî, û bêne astengkirin, helbet ev yek xizmeta dijminê gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê dike, ya duyem nabe girtiyên siyasî girtî bimînin, û divê werin azadkirin yan çarenivîsa wan were diyarkirin, dive lêborîn ji malbatên wan were xwestin, herwiha divê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê leşkeriya neçar rawestîn e û karekî hevbeş di vê derbarê de bê kirin da ku ciwanên me ji welatên Ewropa vegerin û êdî ciwan nema koçber bibin. Cuma Ebdula jî wiha dibêje, çavê miletê me li Kurdistana Sûriyê li yekrêziyê ye, û birçiyê vê yekê ne, divê dilê wan bi her awayî be were xweş kirinm miletê me hêjayî ne ku dilê wan were xweşkirin û êdî wek gelên din jiyaneke xweş bijîn û vegerin ser mal û milkên xwe, û bes rastî astengî û êş û azaran werin ji ber ku ew nema dikarin vê yekê tehemul bikin.

Kurdistana Sûriyê li ber man û nemanê ye

Ebdulezîz Qasim

Tevî dewlemendiya Kurdistana Sûriyê "Rojava" bi kanza û dermal û çavkaniyên xwezayî û bi çandiniyê û petrolê, ku li gorî raporteke berê ya rêxistina geşepêdana navdewletî ku berhemê salekî yê parêzgeha Hisiçe têra xelkê Sûriyê biqasî deh salan heye, herwisa ku li vê dawiyê girêbesteke ji bo zêdekirina berhemhêna neftê û saxbîrkirina kilîngehên petrolê di navbera kompaniya neftê ya Amerîkî "Delta Crescent Energy" û "HSD" de hate îmzekirin û di heyva bê 20.10.2020'an dê bikeve di warê cêbicêkirinê de, û ev girêbest wê bibe derfeteke zêrîn bo xweşkirina jiyana hemwelatiyan û avakirina jêrxana aborî ya navçeyê û herwisa deriyan li pêşiya danpêdanê bi statuyek kurdî vedike, tevî ku heta niha vê girêbestê ti kartêkirin li başkirina jiyana xelkê nekiriye, berovajî ku vê yekê metirsî li bal xelkê deverê zêde kiriye ji ber gef û nerazîbûna Tirkiya û Îran û rejîm û opozisyona Sûriyê û tevlî PKK jî li dijî vê girêbestê.

Tê zanîn ku rewşa deverên kurdî ber bi metirsiyek mezin diçe û pêla koçberiyê careke din ji kurdistanê ber bi Ewropa zêde bûye û ji ber şerê neh salan li ser Sûriyê û şerê dijî rêxistina terorîst ya ISSI û dagîrkariya dewleta Tirkiyê û çeteyên wê li ser Efrînê û Girêspî û Serêkaniyê, ku rojane bi dehan tawanên dijemirov û tawanên cengê li wan navçeyên dagîrkirî li dijî miletê kurd têne pêkanîn digel guhertina demografî û dizîna şûnwarên dîrokî û şewtandina daristanên Efrînê, û berdewam birîna ava vexwarinê ya ji Serêkaniyê li ser bajarê Hisiçe ku jiyana nêzîkî 1 milyon mirovî hercar têxe di bin metirsiyeke mezin de, hevdem digel belavbûna vîrosa korona û nebûna derman û dezgehên saxlemiyê bi awayekî pêdivî ku niha rewşa jiyana miletê kurd ya rojane ber bi karasteke mirovî û trajdiyek xirab diçe.

Li aliyekê din, û li gorî malpera "Al-Araby Al-Jadeed" li roja 26 tebaxê, ku di hevrikiyeke mezin di hevdîtinekê de li Stemolê di navbera serokê opozisyona Sûrî Nasir Alherîrî û şandeya Amerîkî bi serokatiya nûnerê Taybet bo Sûriya, Joel Raybrunn de, ku hevrikiyeke mezin di wê civînê de peyda bû dema ku Alherîrî nerazîbûna xwe diyar kiribû li hember piştgiriya Amerîka ji hêzên HSD û ji lihevkirina kurdî-kurdî re.

Li gorî wê çavkaniyê ku Rayburnn bi hêrs bersiva Alherîrî daye û gotiye berê xwe bidin Şamê çima hûn berê xwe didin Hisiçe, û bal kişandiye li ser tawanên çeteyên opozisyonê li Efrînê û Serêkaniyê û Girêsipî. Dubare tevî rewşa mirovî ya metirsîdar, lê hin jî milet bêhêvî nebûye li hember pêkhatina tifaqa kurdî û danûstandinên berdewam di navbera Encûmena Niştimanî ya Kurd (ENKS) û Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdî de tevî vê dema kurt û dereng hin jî bala xelkê dikeşîne tevlî cûdahiyên mezin di navbera her du aliyên kurdî de, ku tevî pêdiviya siyasî û netewî ya yekrêziya kurdî, hevdem ku îro me pêdivî bi vê yekê û bi rêveberiyek baş heye ji bo rizgarkirina jiyana miletê kurd yê hejar ji vê qeyrana mirovî ya kambax bi peydakirina av, nan, sotemenî, xwendin û tendirustiyê heye.

Şoreşa Eylûlê

ji bo gelê Kurdistanê qonaxeke giring bû

Kurdistan

Şoreşa Eylûlê şorekeke giring ya gelê Kurd bû li ser asta her çar perçeyên Kurdistanê, lewma wê şoreşê bingeheke xurt ji bo şoreşên din yên gelê Kurd li Herêma Kurdistanê danî. Serok Mesûd Barzanî bi boneya 59emîn Şoreşa Îlonê ya di 11ê Îlona 1961ê de peyamek belav kir. Pêncî û neh sal berî niha li rojekê wekî îro mezintirîn şoreşa siyasî û çekdarî û civakî ya gelê Kurdistanê li Iraqê bi navê berevanîkirina li mafên rewa yên gelê Kurdistanê hilpêkir. Şoreşa mezin a Îlonê şoreşeke seranserî ya hemû navçeyên cuda cudayên Kurdistanê û hemû çîn û tiwêj û hemû pêkhatên olî û neteweyî yên Kurdistanê bû. Her çende destkeft û xebat û têkoşîna gelê Kurdistanê ji wê demê heta niha heye hemû encam û berdewamiya hêz û berfirehiya şoreşa mezin a Îlonê ye. Şoreşa Îlonê xwendingehek jî bû, ji bo pêgihandina xebatkar û têkoşerên seranserê Kurdistanê. Ew şoreş îrade û bawerî bi xwebûnê ji bo gelê Kurdistanê vegerand û ji bo neyarên gelê Kurdistanê jî selmandin ku nikarin li rêya îhmalkirin û zordarî û sîtemkariyê wiha li xelkê Kurdistanê bikin destberdarê mafên xwe bin. Şoreşa Îlonê ji bo wê yekê di dîroka xebata gelê me de pir girîng e, ji ber ku di yek navçeyekê de nehate kurtkirin û rêkxistin û bîr û bawerî û Pêşmergebûnê û hêviya kûrahiya dilê xebatkar û têkoşerên Kurdistanê nêzîkî hevdû kir. Di vê bîranîna pîroz de em tekez li wê yekê dikin ku biha û hêz û tîhniya Şoreşa Îlonê em tu demekê ji bîr nakin û ew çiraya rêya xebata gelê me dimîne. Pêzanînên min ji bo xebat û keda hemû şoreşger û Pêşmerge û kadîrên Şoreşa Îlonê heye çi jin û çi zilam ku qehremanane rola wan di vê şoreşa mezin de hebû. Hezaran silav li giyanê pak ê şehîdên Şoreşa Îlonê û hemû şehîdên rêya azadiyê. Herwiha Peyama Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî wiha ye: Di rojeke weke îro de, di 11ê Îlona sala 1961ê de şoreşa mezin a Îlonê pêk hat ku bûye şoreşeke seranserî û xelkê Kurdistanê bi hemû netewe û ol û pêkhateyên cuda, ji Zaxo heta Xaneqînê li jêr serkirdetiya Rêberê Niştimanî Mistefa Barzaniyê Nemir kom bûn.Şoreşa mezin a Îlonê, di demekê de dest pê kir ku bêhêvî li ser Kurdistanê kişiyabû. Dijminên gelê Kurdistanê hemû hewlên xwe didan ji bo jinavbirina kultur û nasnameya gelê Kurdistanê û bêparhiştina ji hemû mafên bingehîn ên jiyanê. Di encamê de hemû xelkê Kurdistanê bûn piştevanên şoreş û îrade û xweragiriya Pêşmerge û têkoşerên rêya azadiyê, gelek destkeftên mezin pêk anîn, ku ji wan herî giring komkirina Kurdistanê bû di bin alayekê û serkirdetiyekê de.

Bêguman yek ji destkeftên dîrokî jî, peymannameya 11ê Adara 1970 bû, dema rejîma Be'sê neçar bû mafên gelê Kurdistanê qebûl bike. Îro ku em salvegera wê şoreşa mezin a Kurdistanê bi bîr tînin, Herêma Kurdistanê di rewşeke dijwar re derbas dibe. Loma gelek pêwîst e ku ruhê xweragiriyê û nirxên bilind ên Şoreşa mezin a Îlonê li ber çavên me bin û handera me ya zêdetir bin ji bo yekrêzî û tebayî û parastina destkeftên xelkê Kurdistanê.Îmad Hesen wiha dibêje, Şoreşa Eylûlê bi serkirdayetiya Bavê Netewa Kurd Mele Mistefa Barzanî hişt ku dijimin bikeve wê baweriyê ku ew nikare miletê Kurd jinav bibe û tişta ku em niha li Herêma Kurdistanê dibînin wê yekê tekez dike, lewma divê ev şoreş neyê jibîr kirin, û hertim di bîra mirov de bimîne û divê em ji zarokên xwe re behsa vê Şoreşê bikin. Semîra Ehmed li ser vê şoreşê wiha dibêje, dijmin di hizra wî de nebû wê şoreş destpê bike, û wî hizir dikir ku gelê Kurd jinav çûye û nema dikare tiştekî bike, lê berûvajî vî yekê şoreş vê ket û gelê Kurd bi raberatiya Barzaniyê nemir dest bi xebateke bêhemba kir ji bo şikandina pîlan û pilanên dijminê gelê Kurd û rakirina ala azadiyê li ser çiyayên Kurdistanê û ya rastî jî ev yek bi cih bû, bi rastî vê şoreş gelek tişt guhertin ne tenê li ser asta Kurdistanê, li ser asta navçeyê jî, lewma divê em hemû wê jibîr nekin û bi bîra neviyên xwe ve bînin da ku bizanin ev şoreş çendî mezin û buha bû.

Nexweşiya Mezin

Kemal Sîno

Ku tu dixwazî
Bihiştê bibîne ?
tewafa paxila yarê bike
ramîsîne
bigvêşîne
bisemîne
her pelandinek
deriyekî vedike
lê heger te divê
dojehê bibîne ?
dûr here
dûr here
libên tizbiyê bijmêre
yan...
qedehên meyê valake
dizanim
tu bi min dikene
bikene û bikene
ez dianim
ez kîme
lê tu nizane
tu kiye
tu nizanî
biheşt..
çiya..
dojeh çine
tu nizanî
YEZDAN kiye
tu nikarî
mirovatî..
sitemkarî..
serbestî..
bindestî..
rindî û nerindî
ji hev cuda bike
û nexweşiya mezin eve
nenasî û wendabûne

Xwendin li Kurdistana Sûriyê di rewşke xerab de ye

Kurdistan- Esmehan Xalis

Hêdî Hêdî rêbazên xwendinê yên rêvberiya PYDê cihên xwe digirin, û bi vê yekê jî xwendekar ji xwendina danpêdankirî bêpar dimînin. Ji bo vê sala xwendinê, êdî tenê dê bekelorya rêveberiya PYD bê xwendin, ji ber ku rêveberiya PYD bekeloriya hikûmeta Esed li navçeyên xwe bi tememî nehîşt. Hejmarek ji xwandekaran bi gazind in û dixwazin ji bo paşeroja xwe, li gor programa hikûmeta Esedbixwînin, lê rêveberiya PYD li ser biryara xwe rijd e. Xelkê deverê dibêjin ew naxwazin paşeroja zarokên wan windayî bimîne, ew paşerojeke tarî naxwazin.Mihemed Ehmed li ser vê mijara giring û hestiyar wiha ji rojnameya Kurdistan re got, rewşa xwendinê li Kurdistana Sûriyê xerab e, û zarokên me bê paşeroj dê bimînin, û bwername û xwendina rêveberiya PYDê bê paşeroj e û ti aliyek danpêdanê pê nake, û ew bi mebest vê yekê dike heta ku nifşekî nezan ava bike û tenê mejiyê wan li ser çek û şeran be.Lewma divê aliyên peywendîdar bi hestiyarî lêkolînê di vê mijarê de bikin û bicidî kar li ser vê mijarê bê kirin, heger na dê karesatek ji aliyê xwendinê ve durst bibe û berpirsê sereke jî ji vê yekê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê ye, û divê ew ji van pêngavên şaş vegere û siyaseta xwe di vê derbarê de serrast bike.

Cemîl Mihemed ku mamosteyê wiha di vê derbarê de got, niha vê rêveberiyê xwendin bê qîmet kiriye, û wê bihêle nifşekî nezane derkeve ku herdem bi wê û biryarên wê ve girêdayî be. Di paşerojê de tekez dê hejmara xwendekarên me li zanîngehên Heleb û Şam gelekî kêm bibin û dê li ser destan jî bêne hejmartin û sedema sereke jî serişkiya PYDê ye ku dixwaze rêbazên xwe bisepîne. Encûmena Nîştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS ligel PYDê li ser vê xalê nakok in, û ENKSê dixwaze ev rêbaz were guhertin û serderî ligel rêbazên danpêdankirî bê kirin da ku paşeroja nifşên bê winda û tarî nebe, û zarokên Kurdan bi xwendin û zanînê bin wek gelên din yên Sûriyê.

Sîpan Remedan ew jî nerîna xwe li ser vê mijarê dibêje, Xwendin li Kurdistana Sûriyê di rewşke gelekî xerab de derbas dibe, û îsal dê rewş gelkî xerabtir bibe, ji ber ku Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê bekeloriya jî bike bi Kurdî û dê xelkê bi vê yekê neçar bike, û ev yek cihê nerazîbûna xelkê deverê ji ber ku ew dixwazin zarokên wan di dibistanên rejîma Esed de bixwînin daku bawernameya wan ya danpêdankirî hebe, û paşerojeke wan ya baş û serkeftî hebe û ew jî wek zarokên gelên din bibin xwedan bawername û bibin dooktor û endezyar û mamoste û bawernameyên wan jî danpêdankirîbin. Divê paşeroja zarokên me neyê winda kirin, emne li dijî zimanê Kurdî û fêrkirina wêne, ew dikarin xelkê bi waneyên zêde li nava dibistanên taybet neçar bikin da ku bi Kurdî bixwînin, yan hin xulan li nav ataxan vekirin û xelkê fêrî zimanê Kurdî bikin,û hewce nake ku wan ji dibistanên rejîmê derxînin û paşeroja wan bixine metirsiyê de,ev biryara PYDê jî helbet Partiya Karkerên Kurdistanê PKKê li pişt wê ye ji ber ku ew naxwze nifşekî ciwan li Kurdistana Sûriyê bixwîne yan zanebe ew dixwaze ev nifiş nezan û cahil be da ku çek hilgire û bikeve nava şerên bê sûd û mifa ku bûne sedema şehîdbûna bi hezaran ji ciwan û keçên me ku piraniya wan xwendekar bûn,û dev ji xwendina xwe berdan û tevlîrefên vê partiyê bûn. Mijara ku ji xwandekaran re bûye pirsgirêk ev e, ku rejîma Esed dabpêdanê bi van rêbazan nake.

Ziyad Mistefa jî wiha li ser vê mijarê dibêje, her welatek pêşketî li ser vê dunyayê bi xwendin û zanînê pêşketiye,lewma ev herdu bingehên sereke ne jiavakirina welatekî yan civakeke pêşketî, û tişa ku em li Kurdistan Sûriyê dibînin berûvajî vê yekê ne,û berûvajî dijatiya xwendinê tê kirin û di jêr navê parastina Zimanê Kurdî, ti Kurdekî binamûs ne li dijî fêrbûna zimanê xwe ye, û ew dixwazin hertim zimanê xwe fêr bibe û zarokên wî jî bi vî zimanî bixwînin,lê ne bi şêweyê ku Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê dimeşîne,ew jî dixwaze xwendevanên deverê bê paşeroj bimînin, wek ku em niha dibînin.

Xwendina bi zimanê dayikê xweş e û bawer nakim ku ti kes xwe jê birevîne,lê divê paşeroja wê hebe û bawernameyên wê danpêdankirî bin,lê heta niha ti aliyekî danpêdan pê nekiriye,lewma xelk zarokên xwe dişînin dibistanên Erebî ku zarokên berpirsan jî diçine van dibistanan û ji xelkê re dibêjin divê hun zarokên xwe bişînin dibistanên rêveberiyê,gelo ma ev yek lojîk e û niha malbatên xwendevanan dudil mane û nema zanin ku zarokên xwe bişînin dibistanên kê,hejmareke zêde ya xelkê jî zarokên xwe dişînin nava bazarê da ku xwendina Erebî bixwînin û hin ji wan jî barkirine Şamê da ku zarokên wan li wir xwendina xwe temam bikin.